

Un bixêr bêh Kîtêbxenê

Hemû kîtêbxaneyên Gästrikland û Hälsingland bihevre dixebitin û bi ”**Hel-Ge Biblioteken**” tên bi navkirin.

Karta deynkirinê (karta endametî) û dema deynkirinê.

Jibo ku tu karibê ji kîtêbxanê tiştêkî deyn bikê divê karta te û ŞÎFRE (PIN)a te hebê. Ew karta te li hemî kîtêbxaneyên Hel-Ge derbas dibê. Bi vê karta xwe ya deynkirinê pirtûk kîtêb), e-pirtûk, film, rojname, kursen ziman, pirtûkên dengîn deyn bikê. Tu karê li kîjan pirtûkxaneya Hel-Ge ti bixwazê, pirtûkê deyn bikê, ya te deynkirî vegeerênê, tu bixwazê jibo te amadebikin yan jî bikevê dorê. Dema (mudeta) vegeerandinê ligor wî tiştê mirov deynkirî tê guhertin. Jibona pirtûka, dema deynkirinê bi pirranî çar heftene. Berî ku dema deynkirinê biqedê bi rêya e-post yan jî SMS tu tê agadarkirin. Meqbûza te tiştêk pê deynkiriye li cem bi parêze; winda neke.

Karta te ya deynkirinê wesîqeke bi qîmete. Berpirsiyarê her tiştê bi karta te bê deynkirin tuwî. Dema karta te winda bibê divê di cîhde tu kîtêbxanê agadarkê jibo kesî din bi karta te pirtûkan deyn neke. Zarokên temenê wan bûbê 6 sal karin bi navê xwe karta deynkirinê derxin. Lø heta zarok bibê 18 sal, dê û bav yan jî weliyê zarokê berpirsin jibo tiştên zarok deynkirine.

Pirranî belaşê lê ne hertişt

Deynkirina ji ”Hel-Ge Biblioteken” belaşê. Lê eger tiştê te deynkirî di dema wêde tu şunde venegerênê, dereng bikevê, jibo her tiştê te deynkirî her roj 1 kron ê ji te bê standin. Hinek kîtêbxane lîstikên-TV (TV-spel) jî bideyn didin. Dema ev lîstika-TV licem te dereng bimînê jibo wê her roja dereng ketî 10 kr distênin. Eger pereyê ji bo derengiyê bibê 100 kr yan zêdetir, hingî karta te ya deynkirinê tê rawestandin. Êdî tu nikarê pirtûka deynbikê heta deynê te danekevê jêr 100 kr.

Eger tiştêk xerabibê yan windabibê

Eger ji tiştên ûn deyndikin tiştêk xera bibê yan jî winda bibê dive tu ligor listeya jêr heqê wî tiştî bide. Gerek tu zanibê heqê tiştê windabuyî yan xerabuyî zêdetir dibê dema ew tişt bihatirbê.

| | |
|-------------------------------------|--------|
| Pirtûk û pirtûkên bi deng ê mezinan | 300 kr |
| Pirtûk û pirtûkên bi deng ê zarokan | 200 kr |
| CD yê muzîkê | 200 kr |
| CD yê zaroka | 150 kr |
| Rojname | 50 kr |
| Film û leyistikên TV | 500 kr |
| Ziman û CD-rom | 500 kr |
| Pirtûka xeberdane ya Daisy | 150 kr |
| Karta deynkirinê (endametiyê) | 20 kr |

Li vê adresê www.helgebiblioteken.se li pirtûka û tiştên din bigerê û li ser wan zêdetir bixwênê.

